Mukaddime, 2017, 8 (Özel Sayı 1), ö41-ö76
doi: 10.19059/mukaddime.364775

# Aheng û Mûsîqî di Helbestên Melayê Cizîrî De

Abdurrahman ADAK[i]

**Kurte**: Aheng, di edebiyatê de hêmaneke bingehîn a şêwaz û estetîka edebî ye. Aheng li ser du beşan dikare bê dabeşkirin: Ahenga rîtmîk (kêş) û ahenga dengan (serwa, paşserwa hwd). Di nav hemû cureyên edebî de herî zêde helbest xwedî aheng e. Ahenga helbestê di heman demê de mûsîqiya helbestê ye jî. Di tarîxa edebiyata Kurdî de aheng û mûsîqî di helbestên Melayê Cizîrî de gihîştiye lutkeyê. Mela di tarîxa edebiyata Kurdî de yekem kes e ku kêşa erûzê bi hemû regezên xwe û bi awayekî serkeftî bi kar aniye. Mela di di Kurmanciya sade ya rojane de jî erûz bêqusûr tetbîq kiriye. Serwaya hundurîn yek ji taybetiyên xweser ên şêwaza Melayê Cizîrî ye. Mela di 31 helbestên xwe de bi şeş şêweyan serwaya hundurîn bi kar aniye û wek şêwazeke taybet behra recezê ji bo serwaya hundurîn terxan kiriye. Mela di helbestên xwe de hunerên bedî'î yên bi ahenga dengan re têkildar jî bi kar anîne ku ew jî hunerên wek î'ade, 'eks, tekrîr û alîterasyonê ne. Di encamê de Mela di helbestên xwe de aheng û mûsîqiyeke bihêz bi dest xistiye, hin şêwazên taybet şopandine û di vî warî de bûye pêşeng.
**Peyvên Sereke**: Melayê Cizîrî, aheng, mûsîqiya helbestê, kêşa erûzê, dubarekirina dengan.

## Harmony and Music in Poetry of Molla al-Jazari

**Abstract:** Harmony is a main element of literary form and aesthetics. It can be classified into two sections: ryhtmic harmony (metric) and sound harmoniy (rhyme, rime etc.). Poetry has more harmony than all other literary genres. Poetic harmony is also poetic music. In the history of Kurdish Literature harmony and music reaches to a paramount level in Molla al-Jezeri's poetry. In the history of Kurdish Literature, Molla was the first poet who used prosody meter successfully in a broader perspective. Molla used prosody in daily Kurdish as well. Internal rhyme is one of independent characteristics of Molla al-Jezeri's form. Molla used internal rhyme with six different forms in his 31 poems and as a special form he reserved recez prosody for internal

[i] Doç. Dr., Zanîngeha Mardin Artukluyê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, abdurrahmanadak@gmail.com.

**Gönderilme Tarihi: 12.12.2017, Kabul Tarihi: 15.12.2017**

rhyme. Molla also used literary arts of sound harmony such as return, inverse and alliteration. To sum up, Molla gained a powerful harmony and music in his poetry, he followed some special forms and became the pioneer of that field.
**Key Words:** Molla al-Jazari, harmony, poetic music, prosody meter, sound repetition.

**Melayê Cizîrî'nin Şiirlerinde Ahenk ve Musiki**

**Öz**: Ahenk, edebiyatta üslup ve estetiğin temel bir öğesidir. Edebiyatta ahenk unsurları iki kısım halinde ele alınabilir: Ritmik ahenk (vezin) ve ses ahengi (kafiye, redif vd.). Edebî türler içerisinde ahenk açısından en üst düzeyde olanı şiirdir. Şiirin ahengi aynı zamanda şiirin musikisidir. Kürt edebiyatı tarihinde ahenk unsurları, bir bütün olarak ilk kez Melayê Cizîrî'nin şiirlerinde ortaya çıkmış ve zirveye ulaşmıştır. Kürt şiirinde aruz veznini geniş bir perspektifle ve başarılı bir şekilde ilk kez Melayê Cizîrî uygulamıştır. Melayê Cizîrî günlük konuşma Kürtçe'sinde de aruzu başarı ile uygulamıştır. İç kafiye, Melayê Cizîrî'de ayırt edici bir üslup özelliğidir. Melayê Cizîrî 31 şiirinde iç kafiyenin farklı altı şeklini uygulamış ve bu şiirlerinde recez bahrini kullanmıştır. Redif ve nakaratlar da Melayê Cizîrî şiirinde önemli ahenk unsurlarıdır. Melayê Cizîrî şiirlerinde ses tekrarı ile ilgili olan bedi'i sanatlarını da kullanmıştır. Bunların başında iade, aks, tekrir ve aliterasyon gelmektedir. Sonuç olarak Melayê Cizîrî şiirlerinde kuvvetli bir ahenk ve musiki elde etmiş, orijinal bazı üsluplar kullanmış ve bu alanda öncü olmuştur.
**Anahtar Kelimeler:** Melayê Cizîrî, ahenk, şiir musikisi, aruz vezni, ses tekrarı.



**Destpêk**

Aheng (di Îngilîzî de "harmonî", di Erebî de "îqa'"), taybetiyeke jêneger a hemû hunerên bedew e. Aheng, di edebiyatê de hêmaneke bingehîn a şêwaz û estetîka edebî ye û bi kurtî wek "rêkxistin û yeksaniya di nezm û pexşanê de ye ku bi bihîstina wê ruhê mirov hestyar dibe" dikare bê pênasekirin. Zanistên hunera edebiyatê yên wek kêş, serwa û paşserwayê û hunerên bedî'î (hunerên edebî) yên wek tekrîr, îade, 'eks û muwazeneyê bi ahengê re têkildar in û her yek ji wan aliyekî ahengê îfade dikin (Yetiş 1988, r. 516; Macit, 2016, r. 14-17; Şemîsa 1378, r. 154). Rabirdûya peyva ahengê di vê wateya berfireh de zêde ne kevin e. Di berhemên belaxeta klasîk de peyva ahengê nehatiye bikaranîn. Lêbelê hin muteradif, yan jî nêzwateyên wê hatine bikaranîn ku ew jî têgehên wek "insicam", "tecanus" "teelluf" û "selaset"ê ne. Têgeha ahengê cara pêşî bi wateya xwe ya edebî ya navborî di dawiya Osmaniyan de di berhemên nezeriyeya edebiyatê de hatiye bikaranîn û bi vî awayî ketiye nav lîteratura edebiyata Tirkî (Yetiş 1988, r. 516; Macit, 2016, r. 14-17). Vê dawiyê ji aliyê Muhsin Macit ve li ser mijara ahengê bi navê *Divan Şiirinde Ahenk Unsurları* (Hêmanên Ahengê di Helbesta Dîwanê de) berhemeke serbixwe jî hatiye nivîsîn (Macit, 2016).

Ahenga metnê edebî, wek mûsîqiya metnê edebî jî hatiye binavkirin. Ji aliyê gelek teorîsyenan ve hebûna pêwendiyekê di navbera helbestê û mûsîqiyê de tê qebûlkirin. Li gor vê, di navbera elhan/usûlên mûsîqiyê û weznên erûzê de hevterîbiyek heye û hin usûlên mûsîqiyê bi hin weznên erûzê yên diyar tên bestekirin (Yetiş 1988, r. 516; Macit 2016, r. 81). Li gor feylesofên ku li ser mijarê hizrên xwe îfade kirine, hem elhan/usûlên mûsîqiyê, hem jî weznên helbestê li ser bingeha tenasubê (ahengê) ava dibin. Ev tenasub jî bi herikbariya nîzamî û perîyodîk ya hereke û sukûnan di kelamê edebî û di nexmeya musîqiyê de çê dibe û ya yekem kêşa helbestê, ya duyem jî nexmeya mûsîqiyê derdixe holê (Zerqanî 1345, r. 143).  Li gor ku Zerqanî vedugehezîne Farabî lehna mûsîqiyê beramberî beyta helbestê û nexme, yanî hêmanên lehnê jî beramberî herfên helbestê dibîne (Zerqanî 1345, r. 139). Hin teorîsyenên Rojava rîtma helbestê dişibînin rîtma mûsîqiyê û ji ber vê jî kêşê bi notayên musîqiyê nîşan didin (Wellek, r. 190). Formalîstên Rûs tevahiya rûdanên ahenga dengan bi têgeha orkestrasyonê îfade dikin (Wellek, r. 180). Teorîsyenê navdar ê edebiyatê Eliot jî ji aliyên curbicur ve di navbera rîtma helbestê û mûsîqiyê de hevbeşiyan tesbît dike û bi giştî di şûna ahenga helbestê de mûsîqiya helbestê bi kar tîne (Eliot 2007, r. 137). Di encamê de tê dîtin ku ahenga metnê edebî û mûsîqiya metnê edebî ji hev cuda nehatine hizirkirin.

Aheng, di heman demê de wek hêmaneke bingehîn a şêwaznasiyê (stîlîstîk/sebkşinasî) jî tê qebûlkirin. Şaxa şêwaznasiyê ya bi ahengê re têkildar, di lîteratura Rojavayî de wek "phonostylistics/fonostîlîstîk" (Aytaç 2016, r. 82) û di lîteratura Îranî de wek "sebkşinasiyî awaha" tê binavkirin û "fonostîlîstîk (sebkşinasiyî awaha) jî beramberî mûsîqiyê tê dîtin (Şemîsa 1378, r. 154). Bêguman aheng hêmaneke bingehîn a estetîka edebî ye jî. Çawa tê zanîn estetîk ('ilmu'l-cemal) bi kurtî wek zanista ku li ser regezên bedewiyê radiweste tê pênasekirin. Estetîk xwe di hunerê de nîşan dide û çawa ku estetîka hemû huneran heye, estetîka hunera edebiyatê jî heye. Ev estetîk jî bi aheng û yeksaniyê tê bidestxistin (Ayvazoğlu, r. 146).



Aheng di metnê edebî de bi şêweyên curbicur derdikeve holê ku ji wan re "hêmanên ahengê" (Macit 2016), yan "hêmanên mûsîqiyê" (Şemîsa 1378, r. 153) tê gotin. Ev hêman bi piranî li ser du beşan hatine dabeşkirin: Aheng/mûsîqiya derekî û aheng/mûsîqiya navekî. Ahenga derekî beramberî kêş, serwa û paşserwayê; ahenga navekî jî beramberî hunerên bedî'î yên wek cînas, îştîqaq, tekrîr, îade, 'eks, muwazene û aliterasyonê tê qebûlkirin (Macit 2016, r. 19; Şemîsa 1378, r. 153). Li gor me ji ber ku ahenga serwa û paşserwayê jî wek cînas, tekrîr û hunerên dî yên bedî'î bi dubarekirina dengan çê dibe, ew jî di kategoriya wan de bê mitalekirin guncawtir e. Di edebiyata Rojava de hin teorîsyenên edebiyatê bi awayekî ku hem ahenga derekî, hem jî ahenga navekî vegire, di şûna ahengê de peyva "rîtm"ê bi kar tînin, hin teorîsyen jî rîtmê ewqas berfireh nagirin û wê tênê ji bo kêşê bi kar tînin. (Wellek, r. 185). Yên yekem "ahenga rîtmîk", yanî kêşê wek "rîtma derekî" û "ahenga dengan", yanî hêmanên bi dubarekirina dengan re têkildar jî wek "rîtma navekî" bi nav dikin û bi vî awayî rîtmê dixin du beş, lêbelê yên duyem ji ber ku ahenga dengan û rîtmê ji hev cuda dikin pêdivî bi dabeşkirineke bi vî rengî nabînin.

Îro li Kurdistana Iraqê lêkolînerên edebiyatê rêbaza yekem dişopînin (Reşîd 2017, r. 19-41). Li gor me eger "rîtm" tenê ji bo dubarekirinên perîyodîk (maweyên diyarkirî), yanî ji bo kêşê bê bikaranîn û wek ahenga rîtmîk bê binavkirin guncawtir e. Di vê rewşê de kêş dê bikeve kategoriya ahenga derekî, serwa û paşserwa jî wek hunerên bi dubarekirina dengan re têkildar dê bikevin kategoriya ahenga navekî. Lewra di serwa û paşserwayê de jî ya esas dubarekirina dengan e. Ji ber ku em wek têgeha vegir peyva aheng/mûsîqiyê bi kar tînin, pêdivî bi dabeşkirineke bi şêweya rîtma derekî û rîtma navekî namîne. Çawa ku di beşa wê de dê di pratîzekirin, di binemaya xwe de ahenga rîtmîk jî bi dengan re pêwendîdar e. Lewra rîtma helbestê bi dubarekirinên dengan ên perîyodîk tê bidestxistin (Wellek 2016, r. 185). Ji vî aliyî ve aheng û deng dibin du peyvên ku ji hev nayên cudakirin (lazimê xeyrê mufariq). Di encamê de dikare bê gotin ku wek têgeha vegir ne rîtm, bikaranîna aheng/mûsîqiyê guncawtir dixuye.

Herçiqas aheng û mûsîqî, çi menzûm çi pexşan, taybetiyeke giştî ya hemû metnên edebî ye jî, ji pexşanê zêdetir di nezmê de xwe nîşan didin. Bi taybetî di helbesta klasîk de tişta ku helbestê ji pexşanê vediqetîne rîtm e. Loma aheng û mûsîqî wek taybetiyeke girîng a helbestê derdikevin pêş û ev taybetî xwediyê girîngiyeke mezin e. Helbestvan di hêz û qudreta xwe ya vegotinê de deyndarê aheng û mûsîqiyê ye. Eger ji kelamê helbestvan mûsîqî bê derxistin, di dest de tiştekî hindik dê bimîne (Zerqanî 1345, r. 127). Ji ber ku aheng û mûsîqî xaleke girîng û jêneger a şêwaz û estetîkê ye, helbestvanê di aheng û mûsîqiyê de serkeftî, di hunera helbestê de serkeftî tê qebûlkirin. Ji bilî vê hin erkên aheng û mûsîqiyê jî hene. Nivîskar bi mebesta ku hizrên xwe bidin qebûlkirin serî li vê şêwazê didin. Gelek caran hizrên gelekî baş ji ber ku ne di qalibê ahengê de tên gotin bandorê nakin. Herweha aheng metnê edebî hêsantir di hiş de dihêle û dide jiberkirin. Di pexşanê de piştî ku naverok hat fêmkirin form têk diçe, lêbelê di helbestê de form her dimîne (Aytaç 2016, r. 72).



Bi qasî ku tê dîtin di nav Kurdan de ji aliyê hunerê ve herî zêde hunera edebiyatê û di nav wê de jî herî zêde hunera helbestê pêş ketiye. Berhemên tarîxa edebiyata Kurdî bi helbestvanan dagirtî ne. Bêguman di nav van helbestvanên Kurd de, bi taybetî di qada Kurdiya Kurmancî de, yê ku her zêde balê dikişîne Melayê Cizîrî ye. Melayê ku di sedsalên şazdehem û hivdehem de jiyana xwe li Cizîra Botan bûrandiye (ji bo jiyan û nasnameya wî bnr. Adak, 2013: 186-210), helbestvanekî damezirîner ê edebiyata Kurmancî ye û li gor agahiyên berdest di nav tevahiya edebiyata Kurdî de yekem helbestvanê xwedî dîwan e. Loma form, aheng û hunerên dî yên helbestê ku berî wî di edebiyata Farisî de gihîştibûn lutkeyê, di edebiyata Kurdî de cara pêşî di destê Mela de dirûv girtine. Gelo ev helbestvanê ku di edebiyata Kurdî de ev rola tarîxî lîstiye, di hunera helbestê de roleke çawa lîstiye ? Gelo girîngiya wî tenê ji damezirîneriya wî tê, yan di heman demê de ji hêza wî ya hunerê jî tê? Gelo eger Mela hunermendekî serkeftî be, di nav sîstema helbesta Îslamî de payeya wî çi ye? Ji ber girîngiya Melayê Cizîrî ya di tarîxa edebiyata Kurdî de, em dixwazin di vê gotarê de di çarçoveya bersivên van pirsan de li ser şêwaza wî ya aheng û mûsîqiyê analîzekê bikin.

Çawa ku Eliot jî amaje pê dike, ji ber ku di sazkirina helbestê de gava ku pêşî tê avêtin binyada rîtmîk e (Eliot 2007, r. 137), em ê jî di gotarê de pêşî cih bidin ahenga rîtmîk, piştre jî cih bidin ahenga dengan.

## I. AHENGA RÎTMÎK: KÊŞA ERÛZÊ

Rîtm, ew aheng e ku ji dubarekirinên yeksan û perîyodîk tê bidestxistin. Mebest ji dubarekirinên perîyodîk jî ew dubarekirin in ku di maweyên diyar de li pey hev tên rêzkirin (Wellek, r. 185). Di rîtmê de perîyodîkbûna dubarekirinê xaleke heyatî ye ku ahenga rîtmîk ji ahenga dengan cuda dike. Yeksanî jî wekheviya jimara heceyên misrayê îfade dike. Rîtm di Kurdî de bi peyva "kêş"ê, di edebiyatên Rojhilatî de bi peyva "wezn"ê, di edebiyatên Rojavayî de jî bi peyva "metre" tê îfadekirin. Di edebiyata cîhanê de sê sîstemên kêşê hatine bikaranîn: Kêşa çendatî (demî), kêşa çawayî û kêşa birgeyî. Di van her sê kêşan de yeksaniya jimara heceyan esas e. Lêbelê digel vê di kêşa çendatiyê de dirêjahî û kurtiya dema birgeyan û di kêşa çawayîyê de jî bihêzî û bêhêziya birgeyan (kirpandina wan) jî li ber çavan tê girtin (Wellek r. 197; Reşîd 2017, r. 14-18). Îcar li nav Miletên misliman ên Rojhilatê yên wek Ereb, Fars, Tirk û Kurdan kêşa çendatiyê/kêşa erûzê) hatiye bikaranîn (Ji bo agahiyên berfireh derheqê kêşa erûzê de bnr. el-Haşimî 1997, r. 8-105; Saraç 2016, r. 201-248). Loma Melayê Cizîrî jî wek helbestvanekî Rojhilatî ev cureya kêşê bi kar aniye û bi vê cureya kêşê mûsîqiya helbestên xwe saz kiriye.



### 1. Cihê Melayê Cizîrî di Tarîxa Kêşa Kurdî de

Melayê Cizîrî wek helbestvanekî edebiyatên Îslamî, di tevahiya helbestên xwe de kêşa erûzê bi kar aniye û bingeha mûsîqiya helbesta xwe bi vê kêşê avêtiye. Dema em li kêşa ku Mela bi kar aniye dinêrin, em dibînin ku ew di tarîxa edebiyata Kurdî de yekem kes e ku kêşa erûzê bi hemû regezên xwe û bi awayekî serkeftî bi kar aniye (Xeznedar 2002, r. 246). Berî Mela helbesta Kurdî ya ku bi Kurdiya Goranî/Hewramî hatibû nivîsîn, bi kêşa birgeyî bû ku li ser du aliyên pênc birgeyî (5+5) dihat dabeşkirin (Gerdî 1999, r. 254-255). Bi qasî ku tê dîtin berî Mela, wek awarteyekê, tenê Baba Tahir di dubeytiyên xwe de kêşa erûzê bi kar aniye, lêbelê wî jî di dubeytiyan de, wek taybetiyeke dubeytiyan, tenê ji behra Hezecê qalibê "Mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun" bi kar aniye (Fesaî 1373, r. 484-485.) Herçiqas berî Mela hebûna hin helbestvanên ku di kêşê de serî li erûzê dane diyardeyeke tarîxî jî be, ji wan helbestvanan yan qet helbest negihîştine me (wek Mîr Yeqûbê Zirkî), yan jî pir kêm helbest gihîştine me (wek Eliyê Herîrî). Loma di tarîxa edebiyata Kurdî de yekem helbestvanê ku kêşa erûzê bi terzê helbestvanên Îranî, bi hemû regezên xwe û bi awayekî serkeftî bi kar aniye Melayê Cizîrî ye. Di edebiyata Kurdî de piştî Mela helbestvanên dî yên Kurmanc (Feqiyê Teyran, Melayê Bateyî û hwd), piştî wan jî helbestvanên Kurdiya Soranî (Nalî, Kurdî , Salim û hwd) û yên Kurdiya Zazakî (Xasî, Babij) kevneşopiya erûzê domandine.

Di tabloya jêrîn de behr û qalibên erûzê yên ku di *Dîwan*a Mela de hatine bikaranîn digel jimarên wan hatine nîşandan. Tablo li ser bingeha doneyên Helîma X. Ebdula hatiye amadekirin (Ebdula 2011, r. 271-281).

| BEHR | | QALIB | | KOJIM | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| J | | J | | Qalib | Behr | Giştî |
| 1 | Remel | 1 | Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun | 13 | 55 | 118 |
| | | 2 | Fa'ilatun fe'ilatun fe'ilun | 11 | | |
| | | 3 | Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilan | 9 | | |
| | | 4 | Fa'ilatun fe'ilatun fe'ilatun fe'ilan | 8 | | |
| | | 5 | Fa'ilatun fe'ilatun fe'ilatun fe'ilatun | 3 | | |
| | | 6 | Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun | 3 | | |
| | | 7 | Fa'ilatun fe'ilatun fe'ilan | 2 | | |
| | | 8 | Fa'ilatun fe'ilatun fe'ilan | 2 | | |
| | | 9 | Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun | 1 | | |
| | | 10 | Fe'ilatun fa'ilatun fe'ilatun fa'ilatun | 1 | | |
| | | 11 | Fa'ilatun fe'ilatun fe'ilatun fe'lun | 1 | | |
| | | 12 | Fa'ilatun fe'ilatun fe'lun | 1 | | |
| 2 | Hezec | 1 | Mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun | 9 | 29 | |
| | | 2 | Mef'ûlu mefa'îlu mefa'îlu fe'ûlun | 9 | | |
| | | 3 | Mef'ûlu mefâ'ilun fe'ûlan | 2 | | |
| | | 4 | Mef'ûlu mefa'îlu mefa'îlun fe' | 2 | | |
| | | 5 | Mefa'îlun mefa'îlun | 2 | | |
| | | 6 | Mef'ûlu mefa'îlu mefa'îlu fe'lun | 1 | | |
| | | 7 | Mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlan | 1 | | |
| | | 8 | Mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlan | 1 | | |
| | | 9 | Mef'ûlu mefa'îlu mefa'îlu fe'ûlan | 1 | | |
| 3 | Recez | 1 | Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun | 17 | 26 | |
| | | 2 | Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilan | 4 | | |
| | | 3 | Mufte'ilun mefâ'ilun mufte'ilun mefâ'ilun | 2 | | |
| | | 4 | Mufte'ilun mefâ'ilun mufte'ilun mefâ'ilan | 2 | | |
| | | 5 | Mustef'ilatun mustef'ilatun | 1 | | |
| 4 | Serî' | 1 | Mufte'ilun mufte'ilun fa'ilun | 3 | 3 | |
| 5 | Besît | 1 | Mufte'ilun fa'ilun mufte'ilun fa'ilun | 2 | 2 | |
| 6 | Muzâri' | 1 | Mef'ûlu fa'ilatun mef'ûlu fa'ilatun | 2 | 2 | |
| 7 | Xefîf | 1 | Fe'ilatun mefâ'ilun fe'ilun | 1 | 1 | |

**Tablo 1:** *Tabloya giştî ya behr û qalibên erûzê yên ku di Dîwana Mela de hatine bikaranîn.*

Çawa tê dîtin, Mela di dîwanê de di 118 helbestan de 7 behrên erûzê, (komên erûzê) bi kar anîne ku ew jî remel, hezec, recez, serî', muzari', besît û xefîf in. Lêkolînerên Kurd ên Başûrî li ser erûza Kurdî hin xebatên îstatîstîkî kirine, bi riya xwendin û vekolîna berhemên helbestvanên Kurd ên navdar, behrên erûzê û qalibên wan behran ên ku di helbestên wan de hatine emilandin tesbît kirine. Eger em nîvekiya encama van lêkolînan derxin, dê derkeve holê ku di helbesta Kurdî de herî zêde û bi rêzê ev qalibên erûzê hatine bikaranîn: Hezec, remel, recez, muzari', muteqarib, xefîf, serî'(Herdî 2004, r. 105-194; Ebdula 2011, r. 215-261; Reşîd 2017, r. 60). Ji ber ku Ehmedê Xanî jî berhema xwe ya bi navê *Nûbihara Biçûkan* di çarçoveya fêrkirina kêşên erûzê de nivîsiye, behrên ku wî di wir de bi kar anîne ji bo erûza Kurmancî ya piştî Mela (sedsal XVII) fikreke baş dide me. Behrên ku Xanî di *Nûbihara Biçûkan* de bi kar anîne ev in: Hezec, remel, recez, muzari, besît, serî' û muteqarib. Lîsteya giştî ya edebiyata Kurdî, lîsteya Xanî û lîsteya Mela di tabloya jêrîn de dikare bê berawirdkirin:

| **Kêş di Edebiyata Kurdî de** | | | |
|---|---|---|---|
| Jimar | **Giştî** | **Xanî** | **Mela** |
| 1 | Hezec | Hezec | Remel |
| 2 | Remel | Remel | Hezec |
| 3 | Recez | Recez | Recez |
| 4 | Muzari' | Muzari' | Serî' |
| 5 | Muteqarib | Besît | Muzari' |
| 6 | Xefîf | Serî' | Besît |
| 7 | Serî' | Muteqarib | Xefîf |

**Tablo 2:** *Behrên erûzê yên ku di helbesta Kurdî de hatine bikaranîn.*

Bêguman behrên ku bi giştî di helbesta Kurdî de hatine bikaranîn ne heft heb tenê ne. Lêbelê behrên ku Mela di *Dîwan*ê de û Xanî di *Nûbihara Biçûkan* de bi kar anîne bi qasî hev in (heft heb). Ji bo ku aheng saz bibe me ji behrên giştî yên edebiyata Kurdî heft hebên ku herî zêde hatine bikaranîn di tabloyê de bi cih kirine.

Dema em li tabloyê temaşa dikin, em dikarin bibêjin ku hemû behrên ku Mela bi kar anîne, pey wî re di helbesta Kurdî de di asta herî bilind de hatine bikaranîn. "Xefîf"a ku Mela bi kar aniye di nav lîsteya Xanî de tunebe jî, di nav lîsteya giştî ya edebiyata Kurdî de heye. Dîsa "besît"a ku Mela bi kar aniye herçiqas di heft behrên lîsteya giştî de tuneye jî, lêbelê di dewama lîsteyê de heye. Ev jî nîşan dide ku piştî Mela sîstema ku wî di kêşa erûzê de daniye hatiye şopandin û behrên ku wî bi kar anîne hatine bikaranîn.

**2. Cihê Melayê Cizîrî li Hember Kêşa Farisî û Tirkî**

Li vê derê em dê di çarçoveya tabloya jêrîn de kêşa Mela, bi kêşên helbesta Farisî û Tirkî re berawird bikin. Eger em ji aliyê behrên ku herî zêde di helbestên Farisî û Tirkî de hatine bikaranîn ve li tabloyê temaşa bikin, dê bê dîtin ku lîsteyên Farisî (Ebdula 2011, r. 158) û Tirkî (İpekten 2002, r. 346-348) bi tevahî wek hev e, lêbelê lîsteya Mela ji wan cuda ye. "Serî'" û "besît"ên ku Mela bi kar anîne di listeyên Farisî û Tirkî de tunene. Herweha "recez"a ku di lîsteya Mela de di rêza sêyem de ye, di lîsteya Farisî û Tirkî de di rêza şeşem de û "xefîf"a ku di lîsteya Mela de di rêza heftem de ye, di lîsteya Farisî û Tirkî de di rêza pêncem de ye. Ev jî nîşan didin ku helbestvanên Tirk di kêşên erûzê de bi tevahî helbestvanên Faris şopandine, lêbelê Mela bi tevahî ew neşopandine û heta bi astekê di mûsîqiya kêşê de şêwazeke xweser şopandiye.

| Jimar | Helbesta Mela | Helbesta Farisî | Helbesta Tirkî |
|---|---|---|---|
| 1 | Remel | Remel | Remel |
| 2 | Hezec | Hezec | Hezec |
| 3 | Recez | Muzari' | Muzari' |
| 4 | Serî' | Muctes | Muctes |
| 5 | Muzari' | Xefîf | Xefîf |
| 6 | Besît | Recez | Recez |
| 7 | Xefîf | Munserih | Munserih |


**Tablo 2:** *Berawirdkirina behrên erûzê yên ku di helbestên Mela , Farisî û Tirkî de hatine bikaranîn.*



Çawa tê zanîn di erûza Erebî de bi giştî 16 behrên erûzê hene ('Ebdûn 2001, r. 32; Tebrîzî 2014, r. 16). Lêbelê di edebiyatên Farisî, Tirkî û Kurdî de sîstema erebî bi tevahî nehatiye kopîkirin û tê de hin guherîn hatine kirin. Her helbestvanekî li gor xwe hin ji van behran û qalibên wan bi kar anîne. Dema em ji vî aliyî ve li Melayê Cizîrî dinêrin, em dibînin ku wî ji van behran heft behr bi kar anîne. Hafizê Şîrazî ku *Dîwan*a wî yek ji jêder û modelên edebî ye ji bo Melayê Cizîrî, ji van 16 behran 10 behr bi kar anîne ku ew jî ev in: Remel, muctes, muzari', hezec, recez, xefîf, muteqarib, munserih, muqtezeb (Ebdula 2011, r. 213). Eger em behrên Hafiz û Mela berawird bikin em dê bibînin ku li cem her duyan rêjeya "remel"ê bilind e û rêjeya "serî'" û "xefîf"ê nizm e. Li aliyekî dî Mela "muctes" bi kar neaniye, lêbelê Hafiz di rêjeyeke bilind de bi kar aniye, herweha Mela "besît" bi kar aniye, lêbelê Hafiz bi kar neaniye. Ji vê jî tê fêmkirin ku Mela ji aliyê kêşê ve bi tevahî Hafiz neşopandiye û di vir de jî heta astekê xwediyê xweseriyekê ye.

### 3. Taybetiyên Kêşê di Helbestên Melayê Cizîrî de

Dema em di bikaranînên behr û kêşên erûzê de li tercîhên Mela dinêrin, em dibînin ku Mela 55 helbest bi remelê, 29 helbest bi hezecê, 26 helbest bi recezê, 3 helbest bi serî'ê, 2 helbest bi muzari'ê , 2 helbest bi besîtê û helbestek jî bi xefîfê nivîsiye. Eger em van bi rêjeya sedeyî îfade bikin, remel %47, hezec % 24, recez %22, serî' %2, muzari' %2, besît % 2 û xefîf %1 e. Ev yek di grafîka jêrîn de jî dikare bê şopandin.




**Grafik:** *Rêjeyên behrên erûzê yên ku di Dîwana Mela de hatine bikaranîn.*

#### 3.1. Tercîha Qalibên Herikbar û Salim

Çawa di grafîka jorîn de jî tê dîtin, Mela, herî zêde behra remelê bi kar aniye. Li pey remelê jî bi rêzê hezec, recez, muzari', besît û xefîf tên. Remel, hezec û recez piraniya helbestên wî saz dikin. Lewra kojima wan dike % 93. Ev jî nîşan dide ku Mela, di piraniya helbestên xwe de kêşên herî zêde herikbar bi kar anîne. Ji van her sê behran remel û hezec, hem di helbesta Farisî, hem jî di ya Tirkî de di rêza yekem û duyem de ne. Lêbelê recez di her duyan de kêm e, li cem Mela zêde ye. Xuya ye ku mûsîqiya rîtmîk a behra recezê gelekî li xweşiya Mela çûye û Mela ew behr bi taybetî ji bo hunera tesmîtê (serwaya hundurîn) terxan kiriye. Çawa li jêrê di beşa serwaya hundurîn de dê bê dîtin, Mela di helbestên xwe yên bi kêşa recezê de bi tevahî serî li serwaya hundurîn daye. Ev jî di şêwaza Melayê Cizîrî de wek taybetiyeke wî ya xweser derdikeve holê.

Çawa tê zanîn di sîstema erûzê de her behrek çendîn qalibên kêşê vedigire. Dema em ji vî aliyî ve li helbestên Mela dinêrin, em dibînin ku rewş hevterîbê rêjeya behran e. Behra ku herî zêde hatiye bikaranîn di heman demê de xwediyê qalibên zêde ye jî. Lewra Mela ji remelê 12, ji hezecê 9, ji recezê 5, ji serî', muzari', besît û xefîfê jî yek qalib bi kar anîne. Kojima qalibên ku bi kar anîne bi giştî dibe 31. Ji van qaliban "mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun" bi 17 qaliban di rêza

yekem û “fa’ilatun fa’ilatun fa’ilatun fa’ilun” jî bi 13 qaliban di rêza duyem de cih girtine. Taybetiya van her du qaliban ew e ku salim in. Dema em qalibên dî yên salim jî li ber çavan bigirin, em ê bibînin ku Mela di kêşê de zêdetir tercîha qalibên salim kiriye. Çawa tê zanîn di kêşnasiyê de ahenga qalibên salim, li gor yên nesalim zêdetir e. Lewra di vê rewşê de periyodên wek hev li pey hev tên rêzkirin ku ev jî tê wateya ahengeke tam Ji vê jî derdikeve holê ku Mela di helbestên xwe de qalibên ku ahenga wan zêde ye tercîh kirine. Bêguman ev yek jî di bihêzkirina mûsîqiya helbestê de roleke girîng dilîze.

### 3.2. Rola Zimanê Kurdî di Erûza Melayê Cizîrî de

Ji ber ku sîstema kêşa erûzê digel yeksaniya jimara birgeyan li ser dirêjahî û kurtiya birgeyan ava dibe, ev sîstem di zimanên ku fonîmên wan ji dengdêrên dirêj û kurt pêk tên de bi awayekî serkeftî tê cîbicîkirin. Loma jî Kurdî wek zimanekî xwediyê fonîmên kurt û dirêj ji bo sîstema erûzê guncaw e. Bêguman Melayê Cizîrî dema erûz bi kar aniye, ji vê avantaja zimanê Kurdî sûd wergirtiye. Ji bo fêmkirina vê yekê rewşa zimanê Tirkî dikare bibe arîkar. Ji ber ku di zimanê Tirkî de tenê dengdêrên kurt hene, di heceyên dirêj ên kêşên erûzê de dengdêrên kurt her dem tûşî îmaleyê tên û ev yek ahenga ziman têk dibe. Li gor tesbîtên lêkolînerên edebiyata Tirkî, di edebiyata Osmanî de bikaranîna erûzê di dawiya Osmaniyan de di sedsala XIXem de bi destê kesên wek Tevfik Fikret, Mehmet Akif û Yahya Kemal kemiliye û helbestên ji aliyê erûzê ve serkeftî di wê serdemê de hatine dayîn. Lêbelê tam di wê demê de hêdî hêdî erûz ji holê rabûye (Levend 1984, r. 629, Macit, 2016, r. 79). Berevajiyê helbesta Tirkî di helbesta Kurdî de kêşa erûzê di destpêka xwe de bi awayekî serkeftî hatiye bikaranîn ku ev yek jî bi destê Melayê Cizîrî çê bûye. Di mînakên jêrîn de aşkera tê dîtin ku Mela, erûzê bi awayekî serkeftî bi kar tîne. Eger bi taybetî li misrayên duyem ên îtalîk bê temaşekirin, dê bê dîtin ku digel ku ew misra bi Kurmanciyeke sade ya rojane hatine nivîsîn jî, di wan de erûzeke bêqusûr hatiye bikaranîn. Ev yek hem guncawiya Kurdiya sade bo erûzê nîşan dide, hem jî wek şêwazeke ahenga Melayê Cizîrî dikare bê qebûlkirin.

**Mustef’ilun mustef’ilun mustef’ilun mustef’ilun**
Mihnetkeş în roz û şebê der firqeta şîrînlebê
*Zulma ji ber destê te bê ew ‘edl e em pir pê xweş în*

**Mefa’îlun mefa’îlun mefa’îlun mefa’îlun**
Ji her bêdax û bêderdî mepirsin mihneta ‘işqê
*Çi zanin bêxeber jana dilê dax û keser tê da*

**Fe’ilatun fe’ilatun fe’ilatun fe’ilun**
Weh ku bê şahid û mehbûbê te ‘umrê xwe buwar
*Karekî rabe bike weqt e ku êvar e dereng*

Mela, di gotinên pêşiyan ên Kurdî de jî ku bi zimanekî sade hatine îfadekirin, kêşa erûzê bi awayekî serkeftî bi kar aniye. Ev yek di misrayên pêşî yên beytên jêrîn de tê dîtin.

**Fe'ilatun fe'ilatun fe'ilatun fe'ilun**

*Belku dîwar(i) bi guh bin* bi Xudê kî bi Xudê

Bi tu rengî nekirî eşkere esrarê hudûs

**Mef'ûlu fa'ilatun mef'ûlu fa'ilatun**

*Bêzî dikit ji qencan ji remz û naz û xencan*

Qedrê gulan çi zanit kerbeş divêt kerê reş

**II. AHENGA DENGAN**

Ahenga dengan ku kategoriya duyem a aheng û mûsîqiya helbestê ye, mijareke girîng a şêwaz û estetîka metnê edebî ye. Çawa ku Wellek jî dibêje, dubarekirina dengan di helbest û pexşana xemilandî de hêmaneke bingehîn a ahengê ye. Helbest wek organîzasyona sîstema dengên zimanekî ye. Helbest û pexşana xemilandî li ser dubarekirina dengan ava dibin (Wellek & Warren, 2016, r. 179). Bêguman rêjeya dubarekirina dengan di helbestê de li gor pexşana xemilandî gelekî zêdetir e. Ev yek ji siruşta helbestê neşet dike. Di helbesta klasîk de ku Melayê Cizîrî jî yek ji nûnerên wê ye, gelek hêmanên ahenga dengan hene. Ji van hêmanan ên ku derdikevin pêş ev in: Serwa, serwaya hundurîn (tesmît), paşserwa, tekrîr, cînas, îştîqaq, î'ade, eks, muwazene, aliterasyon û hwd. Li jêrê em ê di nav helbestên Melayê Cizîrî de li pey şopa van hêmanên ahenga dengan biçin.





**1. Serwa**

Di zimanê Kurdî de serwa ji bo "qafiye"ya edebiyatên Rojhilatê û "reim"a edebiyatên Rojavayê tê bikaranîn. Wek têgeheke edebî serwa, ahengek e ku herî kêm di dawiya du misrayan de, yan jî di wî cihê ku wek dawiya du misrayan tê qebûlkirin de, bi dubarekirina hin dengên du peyvên cihêwate derdikeve holê. Peyvên ku di wan de dubarekirina dengan heye wek "peyvên serwayê" tên binavkirin. Bêguman gelek erkên serwayê hene, lêbelê li vir a ji bo me girîng erka wê ya di sazkirina aheng û mûsîqiyê de ye. Serwa hêmaneke girîng a estetîk û ahenga helbestê ye. Ahenga serwayê ji dubarekirina dengên dawiya misrayan tê bidestxistin. Ji ber ku serwa di kenara beytê de cih digirin, wek "mûsîqiya kenarî" jî hatiye wesifkirin. Xwîner ji bilî zewqa ku ji aheng û mûsîqiya kêşê distîne ji aheng û mûsîqiya serwayê jî zewqekê distîne. Di kêşê de tenê ahengek a perîyodîk heye, lêbelê di serwa de digel ahenga rîtmîk a ku ji kêşê neşet dike, dubarekirina dengan jî heye. Ji ber vê bi saya serwayê bala xwîneran zêdetir bi bal aheng û mûsîqiya helbestê ve tê kişandin (el-Haşimî 1997, r. 108-130; Mevlevi 1994, r.77-82; Saraç 2016, r. 265-275; Haşimî 1390, r. 198-223)

Dema em ji aliyê serwayê ve li helbestên Melayê Cizîrî dinêrin, em dibînin

ku wî di helbestên xwe de bi 31 herfan/dengan serwa saz kiriye (Xeznedar 2002, r. 247) ku ev rêje di hunera helbestê de asteke bilind e û di heman demê de ji bo sazkirina dîwaneke helbestan jî şertekî jêneger e. Ji herfên serwayê yên helbestên Mela 24 heb dengên Kurdî ne (a, b, c, d, e, ê, f, g, h, î, k, l, m, n, p, q, r, s, ş , t, x, v, w, z) û heft heb jî dengên erebî ne ku ji aliyê kurdan ve hatine bikaranîn (ث /s̱, ح /ḥ, غ /ġ, ص /ṣ, ض /ḍ, ط /ṭ, ظ /ẓ). Ji ber ku di helbesta klasîk de yekîtiya helbestê, bi yekîtiya dengê serwayê ku di dawiya hemû beytên helbestê de tê dubarekirin saz dibe, ji encama navborî derdikeve holê ku Mela piraniya dengên Kurdî û çend dengên erebî ku ketine Kurdî, di helbestên xwe de wek "dengê bingehîn" ê helbestê bi kar anîne. Ji bo ku di dîwanekê de monotonî rabe û di dengên serdestî helbestan de dewlemendiyek bê bidestxistin ev regezeke girîng e û Mela di vê regezê de jî bi ser ketiye.

Ji 118 helbestên Melayê Cizîrî, di dawiya 65 heban de serwa bi tena serê xwe û di dawiya 53 heban de jî serwa digel paşserwayê hatiye bikaranîn. Li jêrê ji bo serwaya bêpaşserwa helbesteke nimûne cih digire. Dema em li vê helbestê dinêrin, em dibînin ku di seranserê helbestê de di tevahiya peyvên serwayê de (‘înayet, hîdayet, nîhayet, ayet, wîlayet, rî›ayet, sîrayet, şîkayet, rîwayet, kîfayet û dîrayet) dengê "ayet" hatiye dubarekirin, bi vê şêwazê di helbestê de yekîtiyek hatiye sazkirin û di tevahiya helbestê de aheng û mûsîqiyeke hevbeş hatiye bidestxistin:

Ewwel ku yarê da me yek zerreyek ‘în**ayet**
Qismet me xemr û cam e di deftera hîd**ayet**

Husn û cemalê canan nadêritin tu payan
Herçi nebit bîdayet esla nehin nîh**ayet**

Feyda ‘ulûmê hikmet cama sedef ku gêra
Me j'destê muxbeçan dît bi Mishef û bi **ayet**

‘Arif heta nenoşî ji destê meyfiroşî
Xaib nebû ji hoşî peyda nekir wîl**ayet**

Gunah û zuhd û tamat hilnagirit xerabat
Kesê bi vî derî ret divê bikit rî’**ayet**

‘Işqê ji herdu çeşman ewwel di dil eser kir
Lê zerre zerre axir sotin kir û sîr**ayet**

Şakissilahi her dem bi kuştina Melê bit
Gazindeyan ji kê kim ji kê bikim şîk**ayet**

Cama di destê şahid jengê ji dil dişotin
Pîrê muxan ji rendan weh weh dikir rîw**ayet**
Etwarê 'işq û mestî esrarê butperestî
Teqrîrê sed rîwayet nakit li bo kîf**ayet**

Li yetmeinne qelbî 'eynulyeqîn dibexşet
'Eynul'eyan divêtin kafî nehin dîr**ayet**

Mîrî û padişahî mûyek li nik Melayî
Nadim bi mulkê 'alem yek zerreyek 'în**ayet**

Li gorî rêzikên zanista serwayê, dubarekirina heman peyva serwayê li pey hev baş nayê dîtin. Pêwist e helbestvan di nav peyvên cuda de hevbeşiya dengan saz bike. Lêbelê eger çend beyt bikevin navberê û peyvên dubarekirî ji hev dûr bikevin, wê demê heman peyva serwayê dikare bê dubarekirin. Dema em ji vî aliyî ve li helbestên Melayê Cizîrî dinêrin, em dibînin ku wî ev regeza serwayê, çend awarte ne di nav de, di piraniya helbestên xwe de bi awayekî serkeftî bi cih aniye. Bo nimûne di helbesta jorîn de, di beytên pêşî û dawî yên helbestê de peyva serwayê ('înayet) hatiye dubarekirin. Lêbelê ji ber ku her du peyv ji hev dûr ketine, ev wek qusûreke serwayê nayê dîtin.




**2. Serwaya Hundurîn (Tesmît)**

Carinan di xezel û qesîdeyan de ji bilî serwaya standart a helbestê, di nav beytan de jî serwayeke hundurîn tê sazkirin ku ji vê cureya serwayê re "tesmît" û ji xezel û qesîdeyên bi rengî re jî "xezela musemmet" û "qesîdeya musemmet" tê gotin. Serwaya hundurîn li ser bingeha tef'ileyên kêşa erûzê ava dibe. Çawa tê zanîn, di kêşa erûzê de qalibek di her du misrayên beytê de tê dubarekirin. Bi vî awayî qalibekî çar tef'ile, di beytekê de dibe heşt tef'ile. Îcar di musemmetan de pêwist e ew qalibên erûzê yên ku di misrayekê de dibin çar parçe (tef'ile) û di beytekê de dibin heşt parçe bên bikaranîn, da di dawiya her yek ji wan parçeyan de bi awayekî perîyodîk serwaya hundurîn bê cîbicîkirin. Li vir xala girîng ew e ku di van tef'ileyan de ne dengê serwaya bingehîn a helbestê, dengên dawiya misrayên yekem tê dubarekirin. Yanî serwaya bingehîn a ku di misrayên duyem ên beytan de cih digirin bi serwaya hundurîn re hevkariyê nake. Îcar ji ber ku wek taybetiyeke xezel û qesîdeyê her du misrayên beytên yekem ên helbestê muserre', yanî hemserwa ne, di beytên yekem de serwaya hundurîn yan nayê cîbicîkirin, yan jî bi awayekî cuda tê cîbicîkirin. Bi kurtî di helbestên musemmet de di tevahiya beytan de serwaya hundurîn bi yek sîstemê tê cîbicîkirin, lêbelê beyta yekem derveyî vê sîstemê dimîne. Bêguman ev kêmasiyê naîne ser ahenga beyta yekem. Lewra beyta yekem bi hebûna tesrî'ê (hemserwatiyê) jixwe xwediyê ahengeke bilind e

(el-Haşimî 1997, r. 135; Pala 2003, r. 349).

Di beytekê de serwaya hundurîn tunebe jî, ew beyt bi kêş û serwaya kenarî jixwe xwedîaheng e. Îcar dema li vê ahenga heyî, ahenga serwaya hundurîn zêde dibe, mûsîqiya beytê digihîje asteke gelekî bilind . Ev yek di helbestên Mela de bi zelalî dê bê dîtin.

**2. 1. Hêza Mela di Serwaya Hundurîn de**

Serwaya hundurîn yek ji taybetiyên xweser ên şêwaza Melayê Cizîrî ye. Di çavkaniyê belaxetê de tenê behsa şêweyeke tesmîtê tê kirin ku ew jî hemserwabûna tef'ileyên duyem û çarem ên misrayên yekem û tef'ileya duyem a misraya duyem e (el-Haşimî 1997, r. 135; Pala 2003, r. 349). Lêbelê dema em li helbestên Mela dinêrin, em dibînin ku Mela di *Dîwana* xwe de şeş şêweyên serwaya hundurîn bi kar anine. Bi rastî jî ev di şêwaza helbestê de dahênaneke orjînal û di mûsîqiya helbestê de jî asteke bilind e. Dikare bê gotin ku Mela bi hemû alternatîfên pêkan cih daye vê cureya serwayê. Di *Dîwana* Mela de bi giştî 31 helbest bi vê şêweyê hatine nivîsîn ku ev wek rêjeyeke bilind derdikeve pêş. Di van helbestan de bi awayekî siruştî qalibên erûzê yên heşt tef'ile hatine bikaranîn. Qalibên erûzê yên ku Mela di van helbestan de bi kar anîne, digel jimarên bikaranînê, li jêrê hatine dayîn:

| | |
|---|---|
| Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun/mustef'ilan | 18 helbest |
| Mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun | 5 helbest |
| Mufte'ilun mefâ'ilun mufte'ilun mefâ'ilun | 3 helbest |
| Mufte'ilun fa'ilun mufte'ilun fa'ilun | 2 helbest |
| Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun | 2 helbest |
| Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun | 1 helbest |

Dema em li van qaliban dinêrin, em dibînin ku Mela herî zêde ji behra recezê ji qalibê "Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun" hez kiriye. Lewra kojima wê (18 helbest) bi qasî kojima her pênc qalibên dî heye. Mela bi taybetî bi saya vî qalibî aheng û mûsîqiyeke bihêz li helbestên xwe zêde kiriye. Ev qalibê ku Mela evqas zêde bi kar aniye, xwediyê hin taybetiyên otantîk e. Li gor pisporan ji kevin ve ev qalib di nav Ereban de wek qalibekî xwedî mûsîqiyeke zêde di helbest û stranê de hatiye bikaranîn. Ereban di rêwîtiyên xwe de ji bo hêştirên xwe bi vî qalibî stran digotin. Di mûsîqiya vî qalibî de roleke taybet a serwayê heye. Serwa wê ji peyvên kurt pêk tê û şêweya pêşketî ya nesra kurt a biqafiye (musece') e. Ev wezn di heman demê de di helbestên hemasî û qaremaniyê de jî hatiye bikaranîn (Zerqanî 1345, r. 142). Di çarçoveya rêjeya bilind a vî qalibî de, em dikarin bibêjin ku Mela, bi armanca bihêzkirina akustîka helbestên xwe, xwestiye ji taybetiyên vî qalibî sûd wergire ku ev jî helwesta Mela li hember mûsîqiya helbestê aşkera nîşan dide.

Di çarçoveya edebiyatên Îslamî de, ev şêwaz herî zêde di sahaya Îranê û Azeriyan de hatiye bikaranîn. Lewra em dizanin ku berî Mela kesên wek Se’dî û Mewlana di edebiyata Farisî de (Fesaî 1373, r. 569) û kesên wek Nesîmî û Fuzûlî jî di edebiyata Azerî de serî li vê şêwazê dane. Helbestvanên sahaya dewleta Osmanî zêde serî li vê şêwazê nedane (Macit 2016, r. 12). Ev jî nîşan dide ku helbesta Mela ji sahaya Osmaniyan zêdetir taybetiyên sahaya Îran û Azeriyan hildigire.

### 2.2. Şêweyên Serwaya Hundurîn di Helbestên Mela de

Ji ber ku ji aliyê serwaya hundurîn ve beytên yekem ê helbestê û beytên mayî yên helbestê ji hev cuda ne, em ê li jêrê şêweyên van her du rewşan di musemmetên Melayê Cizîr de bi awayekî berfireh tesbît bikin.

#### 2.2.1. Di beytên Pêşî de

Çawa me got di musemmetan de beytên yekem azad in û derveyî sîstema giştî ya helbestê ne. Di helbestên Mela de beytên yekem bi sê şêweyan serwadar bûne. Li jêrê mînakên her sê şêweyan hatine nîşandan. Ji bo derfeta muqayeseyê piştî beytên yekem beytên duyem jî hatine dayîn. Di beytên nimûne de metnê Selman Dilovan esas hatiye girtin (Şemrexî 2010).

**Şêwe 1:** Di beytên yekem de serwaya hundurîn qet tuneye.

*Fa’ilatun fa’ilatun fa’ilatun fa’ilun*

1.Dilberê îro seher avête cergê min du **dox**
Yek li sîne, yek li dil da lew ji min tên ax û **ox**

2.Ah û oxên min ji di**l tên** lê ji ber tîra qiz**il tên**
Yan ji kovanên di ku**l tên** jê dizêt her xûn û **zox**

**Şêwe 2:** tef’ileya duyem a misraya yekem û tef’ileya duyem a misraya duyem

Di vê şêweyê de serwaya hundurîn di navbera tef’ileya duyem a misraya yekem û tef’ileya duyem a misraya duyem de heye.

*Mustef’ilun mustef’ilun mustef’ilun mustef’ilun*

1.Ahê ji derdê **dil dikit** herçî nedî az**arê çerx**
Derbê li nêva **dil didit** lami’sîfet nûb**arê çerx**

2.Tên sîneyan peykan nih**în** amancê wan tîran em **în**
Dama belayê der kem**în** her goşe dor mad**arê çerx**

**Şêwe 3:** tef’ileyên yekem û duyem ên misraya yekem û tef’ileya duyem a misraya duyem

Di vê şêweyê de serwaya hundurîn di navbera tef’ileyên yekem û duyem ên

misraya yekem û tef'ileya duyem a misraya duyem de heye.

*Mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun*

1.Newaya mutrib û ç**engê** fixan avête xerç**engê**
Were saqî heta k**engê** neşoyîn dil ji vê j**engê**

2.Heyata dil meya b**aqî** binoşîn da bi muşt**aqî**
Ela ya eyyuhe's-s**aqî** edir ke'sen we naw**ilha**

**2.2.2. Di Tevahiya Helbestê de**

Serwaya hundurîn a tevahiya helbestê, di *Dîwan*a Melayê Cizîrî de bi şeş şêweyan hatiye bikaranîn. Li jêrê helbestên Mela yên ku bi van şêweyan hatine nivîsîn yek yek hatine nîşandan. Di helbestan de her du beytên pêşî yên helbestê hatine dayîn. Mebest ji vê ew e ku serwaya hundurîn a beyta pêşî û beytên mayî yên helbestê bê muqayesekirin û beyta yekem a helbestê bê dîtin.

**ŞÊWE 1:**

**tef'ileya duyem a misraya yekem + tef'ileya çarem a misraya yekem**

Di vê şêweyê de di misrayên yekem de du peyvên hemserwa saz dibin. Yanî serwaya hundurîn tenê di misraya yekem de ye. Ev şêwe di van pênc helbestên jêrîn de hatiye bikaranîn. Ji van helbestan tenê di ya yekem de beyta yekem bi şêweyeke cuda xwediyê serwaya hundurîn e, di her çarên dî de beyta yekem bê serwaya hundurîn e.

*Mufte'ilun fa'ilun mufte'ilun fa'ilun*

1.Muxbeçeyên meyfir**oş** her seherê tên s**ema**
Badexworan noşi n**oş** mane li dorê c**ema**

2.Hin gulê bo'enb**er in** hin di şîrîn esm**er in**
Hin guherê dane yin mislê Suheylê s**ema**

*Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun*

1.Dilber şikîna şekerek fe qultu ya rûhî m**eta**
Go min heta xatir hebit min go çi kim ez ba h**eta**

2.Zulfan tu bes çîn ç**în bike** biskên muqabil d**în bike**
Pêşkêşî yek zulfek te bin mulkê Xeten textê **Xeta**

*Mufte'ilun mefâ'ilun mufte'ilun mefâ'ilun*

1.Ahî ji destê wê sirê dil ji meyê hew**ale kir**
Her çi li min kirî Mela camê meya du s**ale kir**

2.Şengî bi nazê m**eşşiha** misk û zubadê w**eşşiha**
Rûy ma di bin piya ne hêj zêde li min del**ale kir**

*Mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun*

1.Ji mabeyna du ebrûyan dibînim qabê qews**eynê**
Te'alellah binê remzê çi reng avête mab**eynê**

2.Binê nûnên li ser s**adan** ku katib goşe lê b**adan**
Seraser qafi ta qaf e rimûza Hikmetil**'eynê**

*Mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun*

1.Bi husna ehsenitteqwîm û zahir sûretê z**at î**
Nezer dî "'ellem-el esma'" we batin 'eynê mir'**at î**

2.Di pabûsa semens**ayê** mi nêrî bejn û bal**ayê**
Le'ellî ebluxu'l-esbabe esbabe's-semawatî



**ŞÊWE 2:**

**tef'ileya duyem a misraya yekem + tef'ileya çarem a misraya yekem + tef'ileya duyem a misraya duyem**

Di vê şêweyê de di misraya yekem de du û di misraya duyem de jî yek, bi giştî di beytê de sê peyvên hemserwa saz dibin. Yanî serwaya hundurîn di her du misrayên beytê de ye. Di vê şêweyê de dema mirov peyvên serwaya hundurîn li bin hev rêz bike, beyt dikeve dirûvê murebbe'ekê. Di *Dîwan*a Mela de 22 helbest bi vê şêweyê hatine nivîsîn ku ev rêjeyeke bilind e. Ji van helbestan di 18 heban de di beytên yekem de jî serwaya hundurîn heye, di çar heban de jî tuneye:

- **Digel beyta yekem**

*Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun*

1. Dîsa ji nû bêh**al e dil** saqî werîn cama zuc**ac**
Muştaqê xemra **al e dil** lê xwoşi anîbit mîz**ac**

2.Saqî ku dêm mehw**eş bitin** kagul ji şêva r**eş bitin**
Qerqef bila at**eş bitin** em dê bi wê dil kîn 'îl**ac**

*Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun*
1.Çîn çîn kirin zulfên si**ya** kesketlesa dîbaq**eba**
Êdî nîşan nabin xu**ya** têkil kirin lazim s**eba**

2.Min dî seba dayê seh**er** madarê bedrê kir du k**er**
Qewsûqezeh jê hate d**er** dîsa be zulfan ra t**eba**

*Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun*
1.Ahê ji derdê dil dik**it** herçî nedî az**arê çerx**
Derbê li nêva dil did**it** lami'sîfet nûb**arê çerx**

2.Tên sîneyan peykan nih**în** amancê wan tîran em **în**
Dama belayê der kem**în** her goşe dor mad**arê çerx**

*Mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun*
1.Newaya mutrib û ç**engê** fixan avête xerç**engê**
Were saqî heta k**engê** neşoyîn dil ji vê **jengê**

2.Heyata dil meya b**aqî** binoşîn da bi muşt**aqî**
Ela ya eyyuhe's-s**aqî** edir ke'sen we naw**ilha**

*Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun*
1.Xelqo li min kin şîr**etê** ew dilbera zerrînkemer
Min dî di halê xefl**etê** hat der ji burcê wek qemer

2.Hat der ji burc û penc**eran** dil girt û da ber xenc**eran**
Ev reng e halê dilb**eran** lew 'aşiqan xûn bûn ceger

*Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun*
1.Selwa sehîqed xemm**ilî** lew kemmilî mest**ane reqs**
Wer suhbetê ger qab**il î** dê bêt û ret şah**ane reqs**

2.Mestane mestan noşan**oş** qerqef di caman hate c**oş**
Ma dê bimînit kes li h**oş** weqtê ku bên durd**ane reqs**

*Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun*
1.Dîsa li bedrê kat**ibî** kêşa ji nû jeng**arê xet**
Nûr e reşandî Wah**ibî** der girdişê perk**arê xet**

2.Herfên ji qudret nuqte p**ur** madarê hewza le'l û d**ur**
Ev rengi kê dî weh bi s**ur** qudretnumûn zeng**arê xet**

*Mufte'ilun mefâ'ilun mufte'ilun mefâ'ilun*
1.Xûn ku ji dil bi mewci b**êt** eşkê rewan me têne x**et**
Nîli ji dîdeyan diz**êt** keftime navê şubhê b**et**

2.Katibê neqşê qudr**etê** zêri reşandî ser x**etê**
Erzen û dêm û cebh**etê** pê neqqişand û kir nuq**et**

*Mufte'ilun mefâ'ilun mufte'ilun mefâ'ilun*
1.Ser didit abê kews**erê** zemzeme û sem**ayê zulf**
Sayenumayê xaw**erê** sidreê munteh**ayê zulf**

2.Sayenumayê cebh**etê** neqş û xetê ji qudr**etê**
Nuqte û herf û cezm**e tê** bal û perên humayê zulf

*Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun*
1.Îro ji şehkasa surê mey hate fincana sed**ef**
Minnet ku dîsa dêmdurê da min meya husna xwe x**ef**

2.Xef da me cama Kews**erê** şîrînqed û lebşek**erê**
Bayê seba da çenb**erê** hatin sema şetrî û l**ef**

*Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun*
1.Îro ji remza dêmd**urê** minnet ku min mesr**ûr e dil**
Dilber bi fincana s**urê** mey da me û mexm**ûr e dil**

2.Remzek nihîn av**êhte dil** mihrê ji batin m**êhte dil**
Şehzadeyê sur r**êhte dil** şehkaseya ferf**ûr e dil**

*Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun*
1.Îro ji husna dilbe**rê** dîsa helak û serxwe**ş în**
Remzên di wê şîrînsu**rê** sohtim bi pêta ate**şîn**

2.Sohtim bi berqa lam**i'e** ew necm û bedra tal**i' e**
Şemsa semayê rab**i' e** lew pur ji şewqê şewwi**şîn**

*Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun*
1.Muhbetê mihnet di z**or in** hub dibêm bêşek bel**a ye**
Umr û jî xweş pê dib**orin** sotin û derd û cef**a ye**

2.Sotin û derdê ev**înê** 'illetê dax û bir**înê**
Xweş dibin ma ew bi d**înê** şerbeta lêvan muf**a ye**

*Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun*
1.Dilberê serdarê x**ûban** ez nizam ageh h**eye**
**'**Arif e b'halê qul**ûban** **'**alim e b'halê m**e ye**

2.'Alim e b'daxê fu**adan** gezmeyên wan nûn û s**adan**
Çûne dil hetta bi r**adan** yengiyê reşgoş**e ye**

*Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun*
1.Îro ji derba xenc**erê** lazim bi êş**an î Mela**
Teşbîhê zulfa dilb**erê** zanim perîş**an î Mela**

2.Zanim perîş**an î ji dil** bê hed bi êş**an î ji dil**
Teşbîhê bury**an î ji dil** billah ne ins**an î Mela**

*Mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun*
1.Xema **'**işqê per**êhtim ez** hebîba xemrevîn k**anê**
Seraser têk beh**êtim ez** ji derdê ferq û hicr**anê**

2.Fîraqa dilbera rend e behêtim her wekî finde
Musilmanik di rê min de xeber bit balê sultanê

*Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun*
1.Îro ji nû purat**eş im** dîsa ji remza dilb**erê**
Mecrûhê qewsê purw**eş im** tîr dane nêva ceg**erê**

2.Tîr dan ji qewsê esw**ed e** şehzadeya şîrînq**ed e**
Kuştîne wek min çends**ede** wê padişah û begl**erê**

*Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun*
1.Ellah sehergaha **ezel** yelmûmê 'işqê şu'l**e da**
Nûra cemala lem y**ezel** zatê tecellaya xw**e da**

2.Zatê tecella bû li z**at** bêism û asar û sif**at**
Sirra hurûfên 'aliy**at** xef bû di sitr û perd**e da**

• **Ji bilî beyta yekem**

*Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun*
1.Meşşateê husna ezel çengalê zulfan t**ab(i) da**
Da 'işqi hil bit pêli pêl qelbê me pê cell**ab(i) da**

2.Husna hebîb û lutfê yar avête dil 'işqa xedar
Lew selbi kir jê ixtiyar wê husnê ev îc**ab(i) da**

*Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun*
1.Dilberê îro seher avête cergê min du d**ox**
Yek li sîne, yek li dil da lew ji min tên ax û **ox**

2.Ah û oxên min ji d**il tên** lê ji ber tîra qiz**il tên**
Yan ji kovanên di k**ul tên** jê dizêt her xûn û z**ox**

*Mufte'ilun fa'ilun mufte'ilun fa'ilun*
1.Şahidê qudsînîşan husn e ji remza **ezel**
Da me bi destê surê camê meya lem y**ezel**

2.Mey ku biçit **saxerê** di destê wê **dilberê**
Sondê bi Xaliq dixum roj e di burca Hem**el**

*Mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun*

1.Ji remza dilberê dîsa li min batin vejîn d**erde**
Di lebsê tariyê min dî xuya bû ew siyahc**erde**

2.Di lebsê tarî û n**ûrê** perîrengê sifeth**ûrê**
Ji wadê Eymena T**ûrê** muqeddes kir li min **'erde**

**ŞÊWE 3:**

**- Misraya Yekem: tef'ileya yekem + tef'ileya duyem + tef'ileya sêyem + tef'ileya çarem**

**- Misraya Duyem: tef'ileya yekem + tef'ileya duyem + tef'ileya sêyem**

Di vê şêweyê de serwaya hundurîn, di her çar tef'ileyên misraya yekem de di nav xwe de ye û di her sê tef'ileyên pêşî yên misraya duyem de jî di nav xwe de ye. Bi vê şêweyê du helbestên Mela hene:

*Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun*

Yarê me p**ur** nîşan û s**ur** sîma ji d**ur** dêm kewk**eb e**
Ew lebşek**er** nazikbeş**er** cebhetseh**er** kagul**şeb e**

Şebkag**ul e** xalfulf**ul e** çînsunb**ul e** dava **dil e**
Min xefle**tê** dî qible**tê** wek mah di**tê**sa xebx**eb e**

Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun

Min dî seh**er** şahê Mec**er** libsê di b**er** mexm**ûr(i) bû**
Ew dêm-z**erî** sur-muşt**erî** ya Reb p**erî** ya h**ûr(i) bû**

Hûrîw**eş e** şîrînm**eş e** kakulr**eş e** xalheb**eş e**
Xalên di q**er** miska Tet**er** nazikbeş**er** kaf**ûr(i) bû**

**ŞÊWE 4:**

**tef'ileya yekem a misraya yekem + tef'ileya duyem a misraya yekem + tef'ileya sêyem a misraya yekem + tef'ileya çarem a misraya yekem + tef'ileya yekem a misraya duyem + tef'ileya duyem a misraya duyem + tef'ileya sêyem a misraya duyem**

Di vê şêweyê de tef'ileya heştem ne tê de, di dawiya her heft tef'ileyên dî yên beytê de bi yekpareyî serwaya hundurîn heye. Dema peyvên serwayê yên

beytekê li bin hêv bên rêzkirin, dirûvê musemmenê pê dikeve. Di vê şêweyê de aheng û mûsîqiya ku ji dengên serwaya hundurîn tê bidestxistin digihîje lutkeyê. Bi vê şêweyê du helbestên Mela hene:

*Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun*

1.Min dî ji x**ef**let cam di k**ef** Şahê Nec**ef** dil kir hed**ef**
Roj hat şer**ef** stêr bûne x**ef** her çar ter**ef** nûra yeq**eq**

2.Zulmet n**ema** suhbet w**e ma** nûra ş**ema**lan çû s**ema**
Lê ew d**ema** zulf bûn c**ema** hatin s**ema**yê yeknes**eq**

**ŞÊWE 5:**

**tef'ileya duyem a misraya yekem + tef'ileya çarem a misraya yekem + tef'ileya duyem a misraya duyem + tef'ileya çarem a misraya duyem + tef'ileya duyem a misraya sêyem + tef'ileya çarem a misraya sêyem + tef'ileya duyem a misraya çarem + tef'ileya çarem a misraya çarem + tef'ileya duyem a misraya pêncem + tef'ileya çarem a misraya pêncem + tef'ileya duyem a misraya şeşem + tef'ileya çarem a misraya şeşem + tef'ileya duyem a misraya heftem + tef'ileya çarem a misraya heftem**

Di vê şêweyê de serwaya hundurîn di bendan de hatiye cîbicîkirin û tef'ileyên duyem û çarem ên hemû misrayên bendekê bi yek serwayê hatine sazkirin. Ji bilî vê wek taybetiya forma terkîb bendê, di navbera misrayên wasiteyê de jî serwayeke hevpar a cuda heye. Ev şêwe jî hem orjînal e, hem jî aheng û mûsîqiyeke bilind bexşî helbestê dike. Bi vê şêweyê terkîb bendeke Mela ya 12 bendî heye ku li jêrê du bendên wê hatine dayîn.

*mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun*

**1**

Îro mi dî weqtê seh**er** ew dilbera sundus di b**er**
Dîsa di lebsê sor û z**er** nûrek munezzeh bû beş**er**
Biskên siyah xalên di q**er** reşkagulê zulf çûne s**er**
Eswed bû daîm secde b**er** min bestî 'eqda niyy**etê**
Xeflet bi sir da min nez**er** mêran bi qetlê kir xed**er**
Tîr dane dil şahê Mec**er** bê mirwet amanc kir ceg**er**
Feryad û efxan sed kes**er** wesfan neşêm lê ev qed**er**

Zanim ku roj bû hate der subhan ji şahê qudretê

**2**

Subhan ji te şahê cel**al** hostayê pur qudret li b**al**
Xasa te dayî ev cem**al** dêmê ji qudret xett û x**al**
Kifş bû di qewsê da hil**al** vê ra mi dî bedra kem**al**
Lê bûn nîqab çewkan û d**al** wan yek bi mestî daye p**al**
Lê seyyirî bayê şim**al** pêçane ser nûra zel**al**
Qet kes diyin ev rengmîs**al** mutrib were weqt e w’mec**al**
Zaza bi nayê ra bin**al** saqî werîn xemra hel**al**

Carek ji ser dêmê vimal zulfên li dora cebh**etê**

**ŞÊWE 6: Tenê di hin beytên helbestê de**

Mela carinan serwaya hundurîn ne di tevahiya helbestê de, tenê di hin beytên helbestê de cîbicî kiriye. Sê helbestên Mela bi vê şêweyê hene. Li jêrê wek nimûne helbestek ji van cih digire:

Di dest da yengiyek nûb**arî** min dî ew kem**anebrû**
Li bala cedwelek Cebb**arî** lêda hemqir**an ebrû**

Ku Heq ev herf û xet kêş**an** li talayê me derwêş**an**
Du qewsan goşe lê bad**an** we ser peyweste m**an ebrû**

Te dîdarê te reft**arê** te elemasên şekerb**arê**
Bi ‘eynî rê li ser sadan du nûn reyhan num**an ebrû**

Bi hemdillah bi feyrozî li wechê dilberê min dî
Ku mahê nû nîşan min dan li taqê asîm**an ebrû**

Te’alellah nîşan **dane** bi husnê ev neseq **dane**
Ji neqş û sen’etê Heq ev nîşançeşm ev nîş**anebrû**

Ji re’na nêrgizên şehla mecalê hemqeran bînim
Hezar remz û îşarat in ji wan qewsên çev**an ebrû**

Mela dil têk te peyk**an in** ji mehbûban me nîş**an in**
Kemendarên di xeddar **in** di burca esmer**an ebrû**

Her du helbestên dî jî weha dest pê dikin:

Ewwel ku yarê da me yek zerreyek ‘înayet
Qismet me xemr û cam e di deftera hîdayet
-
Wellah ji herdu ‘alem**an** min husnê can**an e xered**
Lew min ji husna dilber**an** her sun’ê Rehm**an e xered**

**3. Paşserwa**

Piştî serwayê û di dawiya misrayan de ji her cure dubareyên ku tên kirin re paşserwa (redîf) tê gotin. Tiştên ku tên dubarekirin xwedî wate ne û di hevokê de erkekê hildigirin ser milê xwe. Di paşserwayê de dengên ku tên dubarekirin, carinan ji qertafan, carinan ji qertaf û bêjeyan, carinan jî tenê ji bêjeyan pêk tên. Formên duyem û sêyem aheng û mûsîqiya helbestê bihêztir dikin. Paşserwa jî wek serwayê mûsîqiya kenarî ya beytê saz dike û ji bilî kêş, serwa û serwaya hundurîn wek hêmaneke dî ya ahengê derdikeve pêş û bi saya wê aheng hê jî zêdetir dibe. Ji ber ku paşserwa di tevahiya helbestê de tê dubarekirin, di helbestê de ahengeke yekpareyî derdixe holê (el-Haşimî 1997, r. 108-130; Mevlevi 1994, r.77-82; Saraç 2016, r. 265-275; Haşimî 1390, r. 198-223).

Ferqa serwayê ji paşserwayê ew e ku dengên ku tên dubarekirin watedar in. Dema em ji vî aliyî ve li paşserwayên ku Mela bi kar anîne dinêrin, em dibînin ku sê şêweyên wan hene: Hin ji wan peyvên sade ne ku di jiyana rojane de tên bikaranîn û wateya yekem û ya heqîqî didin. Wek “da”, “girt”, “kir”. Hin ji wan wateyên taybet didin û ji termên felsefî û nezerî pêk tên. Wek “hudûs” û “xered”ê. Hin ji wan jî komepeyv û hevokên dirêj ên xwedî mesaj in. Wek “Dil ji min bir dil ji min”. Bêguman ji aliyê mûsîqiya helbestê ve her du şêweyên dawî girîng in û ji bilî ahengê mesajekê jî didin. Bo nimûne dema di helbestê de paşserwa “xelet” be, di tevahiya wê helbestê de mesaja xeletiyê tê dayîn. Şêweya duyem a paşserwayên Mela bi taybetî gelekî orjînal in. Çawa hat gotin Mela di wan paşserwayan de peyvên felsefî û razber ên wek “‘ebes, xered, behs, reqs, çi hez û xelet” bi kar anîne. Ev yek wek taybetiyeke şêwaza Sebkê Hindî jî tê zanîn ku di sedsala XVIem de di serdema Sefewiyan de belav bûye (Fesaî 1373, r. 569). Digel ku di serdema Mela de Sebkê Hindî bandora xwe tam nîşan nedabû jî, bikaranîna vê şêwazê ji aliyê Mela ve wek xweseriyeke wî di sebkşinasiyê de dikare bê dîtin.



**4. Şêweyên Têkel**

**4. 1. Serwaya Hundurîn û Paşserwaya**

Mela di du helbestan de aheng û mûsîqiyeke taybet ji serwaya hundurîn û paşserwayê saz kiriye. Di helbesta yekem de formula hevahengiyê bi vî rengî ye: **tef’ileyên yekem, duyem û çarem ên misrayên yekem û tef’ileya duyem a misraya duyem û paşserwaya komepeyv**

Şox û ş**engê** zuhrer**engê** ***dil ji min bir dil ji min***
Awirên heybetpel**engê** ***dil ji min bir dil ji min***

Wê şep**alê** miskix**alê** dêmdurê gerdenşem**alê**
Cebheta biskan sem**a lê** ***dil ji min bir dil ji min***

Zulf û x**alan** nûn û d**alan** wan ji min dil bir bi t**alan**
Goşeê qewsê hil**alan** ***dil ji min bir dil ji min***

Di helbesta duyem de jî formula hevahengiyê bi vî rengî ye: **tef'ileyên duyem û çarem ên misrayên yekem û tef'ileya duyem a misraya duyem û paşserwaya komepeyv**

Vê firqetê ebt**er kirîn** ***feryad ji destê firqetê***
Jar û zeîf û z**er kirîn** ***feryad ji destê firqetê***

Pur zer kirîn wek zê**ri mam** çehvên di lutfê pî**ri mam**
Daîm li rê çavnê**ri mam** ***feryad ji destê firqetê***

Çavnêrê reft**ara te bûm** muştaqê gulz**ara te bûm**
Lew dûr ji dîd**ara te bûm** ***feryad ji destê firqetê***



**4. 2. Serwaya Hundurîn û Neqerat**

Mela di terkîb-bendekê de aheng û mûsîqiyeke taybet ji serwaya hundurîn û neqeratê saz kiriye. Di vê helbestê de jî formula hevahengiyê bi vî rengî ye:

**- tef'ileyên, duyem û çarem ên misrayên yekem û duyem di nav xwe de**
**- tef'ileyên, duyem û çarem ên misrayên sêyem û çarem di nav xwe de**
**- tef'ileyên, duyem û çarem ên misraya pêncem**
**- neqerat**

Di seranserê vê helbestê de tekrîra îfadeya "sebahulxeyr(i) ya xanim" çêjeke cuda dide ahengê. Ev îfade ji bilî ku di hemû misrayên pêncem de di her du tef'ileyên dawî de hatiye dubarekirin, di destpêkên misrayên yekem ên her du bendên pêşî de jî hatiye bikaranîn. Bi vî wî awayî peykera helbestê li ser wê îfadeyê ava bûye û bikaranîna di destpêkê de jî rola sernav lîstiye.

***Sebahulxeyr(i)*** x**anê min** şehê şîrînzeb**anê min**
Tu wî rûh û rew**anê min** bibit qurban te c**anê** min
Te'alEllah çi z**at î tu** çi wê şîrînsif**at î tu**
Ne wek qend û neb**at î tu** yeqîn rûh û hey**at î tu**
Heyat û raheta c***anim sebahulxeyri ya xanim***
***Were bînahiya çehvan bibînim bejn û balayê***

***Sebahulxeyr(i)*** m**esta min** letîfa cam bi d**esta min**
Xumar û meyp**eresta min** tu wî meqsûd û q**esta min**
Ji meqsûdan tu wî b**es min** bibin ber çerxê etl**es min**
Ji xeyrê te nevêt k**es min** bi reştûzên muqeww**es min**
Di benda zulfê çewk**an im *sebahulxeyr(i) ya*** **xanim**
***Were bînahiya çehvan bibînim bejn û balayê***

Ji wê zulfê ji wê b**endê** reha bim lê ji peyw**endê**
Siyehçeşmê sipîz**endê** te sohtim şubhetê f**endê**
Şubhê şem› û şem**al im ez** ji ber hubba te l**al im ez**
Ze'îf im wek hil**al im ez** sifetgoyîn dik**alim ez**
Vi bulbul ra bi evx**an im *sebahulxeyr(i) ya*** **xanim**
***Were bînahiya çehvan bibînim bejn û balayê***

Vi bulbul ra şev û r**ojê** li ser wê terh û bişk**ojê**
Enîmahê şefeqr**ojê** te sohtim şubhetê d**ojê**
Ko dûr im ez ji wê h**ûrê** tinê carek li ser s**ûrê**
Ji Wadê Eymena T**ûrê** tecella kir di nêv n**ûrê**
Ji wê sohtî dil û ca**nim *sebahulxeyr(i) ya*** **xanim**
***Were bînahiya çehvan bibînim bejn û balayê***

Ji husna wê tecell**ayê** yedê beyda û bal**ayê**
Çi wesfan bêm xeber n**ayê** welê dil cezbeê d**ayê**
Ne hişyar im ji wê b**erqê** ji zertacê li ser f**erqê**
Sipêde da heta ş**erqê** belê naêximê f**erqê**
Ji derbê 'işqê nal**an im *sebahulxeyr(i) ya*** **xanim**
***Were bînahiya çehvan bibînim bejn û balayê***

Zerîf î nazik î ş**eng î** sifethûr î perîr**eng î**
Bi rojê ra tu hevd**eng î** du reştûzên siyehy**eng î**
Kişandin lê ne wek c**aran** xedengên qewsê nûb**aran**
Ji rengê şîr û mûk**aran** reşandin sîne wek b**aran**
Ji wê derbê pur êş**an im *sebahulxeyr(i) ya*** **xanim**
***Were bînahiya çehvan bibînim bejn û balayê***

Veke carek xet û x**alan** li ser wan mesned û p**alan**
Bixwûne lê me 'ebd**alan** bibînin 'îd û sers**alan**
Îcazet dî me dest**ûrê** perîrengê sifeth**ûrê**
Ji nêva zulmet û n**ûrê** binoşîn mey di ferf**ûrê**
Ji dil talanê x**alan im *sebahulxeyr(i) ya*** **xanim**
***Were bînahiya çehvan bibînim bejn û balayê***

Ji şehkasa ku qerq**ef tê** meya nûrîn muşerr**ef tê**
Nîşanek dilberê k**eftê** ji bo min her seher x**ef tê**
Ji wê camê dino**şim ez** seher lew ney li ho**ş im ez**
Ji 'amê lê dipo**şim ez** bi can her lê diko**şim ez**
Ku xalib mest û sukr**an im *sebahulxeyr(i) ya*** **xanim**
***Were bînahiya çehvan bibînim bejn û balayê***

Were pêşber Mel**ayê xwe** şehîd û mubtel**ayê xwe**
Bi şefqet ke lîq**ayê xwe** Mela nemrit bi d**ayê xwe**
Mesîha yî li bîm**aran** kesên geztî du reşm**aran**
Şehîdên şîr û mûk**aran** kirî amancê nûb**aran**
Li dîdara te heyr**an im *sebahulxeyr(i) ya*** **xanim**
***Were bînahiya çehvan bibînim bejn û balayê***

**4.3. Wasite û Paşserwa**

Di tercî'-bendan de misrayên wasiteyê di navbera hemû bendan de dubare dibin. Dema di hemû misrayên bendê de paşserwa jî dubare dibin di helbestê de mûsîqiyeke taybet zal dibe. . Sê helbestên Mela bi vî rengî hene (du tercî'-terkîb û tercî'ek). Li jêrê wek nimûne bendek digel misrayên wasiteyê cih digire:

Me bi dil nêrgizên xass**e divên**
Semen û yasimînê taz**e divên**
Nazik û neyşekerên tuhf**e divên**

Sosinên nazik û terwend**e divên**
Dilberên dêmdur û durdan**e divên**
Kewkebên şewq û şefeqzuhr**e divên**
Nazê perwerde û şehzad**e divên**
Sayeperwerde me bêperd**e divên**
Serwîqed dêmgul û lebxunç**e divên**
Ayetullahê şerîfnusx**e divên**
Lê bi î'rab û xet û cezm**e divên**
Dilrubayan ne tinê xemz**e divên**
Bi Mesîhasifetî işw**e divên**
Samirî sihrisifet şêw**e divên**
Senemên sur ji Semed her m**e divên**
Ji me eswedheceran secd**e divên**
Bi ziyaret me ji wan bûs**e divên**
Turreya şeng î dil'aşuft**e divên**
Mihridarên xwe di pejmûrd**e divên**
Pêşkişa te me dused naf**e divên**
Sed hezar etles û hem xar**e divên**
Her li bo zînet û xemla t**e divên**

Textebend û sifetên qeys**eriyê**
***Dînberê horîmîsalê z*eriyê**
***Nazikê neyşekerê surp*eriyê**

Li jêrê misrayên wasiteyê yên her du helbestên dî jî cih digirin:

***Senema sur ji Semed şewqê ji Heq daye w*ucûdê**
***Ger 'Ezazîlî bidîta nedibir xeyrê s*ucûdê**

Ew e min rûh û heyat û ew e min qibleê z**at**
***Senema sur ji Semed neyşekera leb ji neb*at**
**Ehesenellahu tebarek ji sura wê senemê**

**5. Hunerên Bedî'î yên bi Ahengê re Têkildar**

Ji bilî ahenga ku ji kêş, serwa, serwaya hundurîn, paşserwa û neqeratan tê bidestxistin, ji hin hunerên bedî'î (hunerên edebî) jî ahengeke cuda tê bidestxistin ku ew jî di çarçoveya ahenga dengan û mûsîqiya helbestê de tên mitalekirin. Em ê li vir di *Dîwan*a Melayê Cizîrî de tenê di çarçoveya hunerên î'ade, 'eks, tekrîr û alîterasyonê de ji bo ahenga ku ji van hunerên edebî tê bidestxistin çend nimûneyan pêşkêş bikin. Bêguman dema mûsîqiya van huneran li mûsîqiya ku ji hêmanên dî yên ahengê tê bidestxistin zêde dibe, çêjeke cuda tê bidestxistin.

**1. Î'ade**

Eger di helbestekê de bêjeya dawî ya beytekê, yan bendekê di serê beyt, yan benda peyrew de bê dubarekirin ew dibe hunera "î'ade"yê. Di îadeyê de peyv bi tevahî tê dubarekirin. Lêbelê eger hin cudahiyên buçûk hebin, bo nimûne di serî yan dawiya peyvekê de edatek hebe û di ya dî de tunebe, ew zererê nade hunera îadeyê (Saraç 2016, r. 263).

Li jêrê ji bo hunera î'adeyê di helbestên Melayê Cizîrî de, çend nimûne cih digirin:

•

Ez dibêm 'Îsa ye ew ya Bû 'Elî Sîna ye ew
Lew bi remz û 'işweyan pur mu'cizat û **şêwe** ye

**Şêwe** û remzên di wê teşbîhê berqê lami' in
Kohê Qaf bit ker dikit sata xuya bit **perde** ye

**Perde**ya mehbûb di nêv qelban ku dê kerker bikit
Qet di perdê xef dibin Xurşîd û Mah û **Zuhre** ye?

**Zuhre** û Xurşîdi min dîtin di qewsê hemqeran
Surrê da dil 'eqreban çerx û sema û heyhey e

•

Kuştim bi qewsê 'enber e şoxê ji dil mil dan ber e
Êxiste dil sed pencere ev renge em **mihnetkeş în**

**Mihnetkeş în** roz û şebê der firqeta şîrînlebê
Zulma ji ber destê te bê ew 'edl e em pur pê xweş în

**2. ‘Eks**

‘Eks di ferhengê de tê wateya qulibandin û berevajîkirinê. Di belaxetê de eger komek peyvên ku hatine bikaranîn, piştre ji paş ve bi awayekî serûbinkirî bên bikaranîn, hunera ‘eksê derdikeve holê. Ferqa ‘eksê ji qelbê ew e ku tişta ku ji dawiyê tê xwendin di qelbê de herf in, di ‘eksê de peyv in (Teftazanî 1960, r. 394; Bilgegil, 1989, r. 331; Saraç 2016, r. 267).

Li jêrê ji bo hunera ‘eksê di helbestên Melayê Cizîrî de, çend nimûne cih digirin:

•

**Rast û çep** tên ceger û sîne kulab

‘Er’erên şengi di mest in **çep û rast**

•

Gote me durdane yî **em ji te** û **tu ji me** yî

Lew bi heqîqet yek în mes’ele bê şubhe ma

•

Pur di pê weslê me **se’y û cehde** da

**Cehde û se’ya** me hatin der ‘ebes





**3. Tekrîr**

Tekrîr tê wateya tekrar û lêvegerê. Wek têgeheke belaxetê eger di nav metnekî edebî de peyv, yan komepeyvek çendîn caran li pey hev û bi piranî b awayekî sîmetrîk bê dubarekirin ew hunera tekrîrê ye. Di hunera tekrîrê de wate tê bihêzkirin, li ser wê wateyê bal tê kişandin û bi vî awayî heyecanek tê bidestxistin. Ji bo ku dubarekirin asteke edebî bi dest bixe, divê van taybetiyan bicivîne. Eger bêyî van taybetiyan tiştek bê dubarekirin ew ji rewanbêjiyê dûr dikeve û nakeve kategoriya hunera tekrîrê. Ji ber ku di musemmetên mutekerrir de misrayên dawî yên hemû bendan tên dubarekirin, ew jî dikevin kategoriya hunera tekrîrê. Di tercî’ bendan de jî beytên dubareyê yên nav bendan dibin tekrîr (Bilgegil 1989, r. 252-256; Saraç 2016, r. 196).

Li jêrê ji bo hunera tekrîrê di helbestên Melayê Cizîrî de, çend nimûne cih digirin:

•

Te’alellah zehî husna mubarek

**Tebarek sed tebarek sed tebarek**

•

Dil girt û da ber xenceran kuştim nigar û dilberan

Me j’destê zulma esmeran **dad û meded dad û meded**

Di van her du mînakan de peyvên “tebarek”, “sed tebarek” û “dad û meded” bi awayekî sîmetrîk hatine dubarekirin.

•

Tu binê sazê bi awazi çi rengî me dixwazit
**Ellah Ellah** bi Xudê qet dibihê ev çi xîtab e

Te dizanim te dibînim ku tu wî nûrê wucûd
**Ellah Ellah** ji çi nûr e di seraya me lebaleb

**Ellah Ellah** ku di ‘umrê xwe tu carek nebihê
Çi seda tête ji vê gunbedê dewwarê hudûs

Te bi firyad û fixanan bi xwe bulbul kerr kir
**Ellah Ellah** ji çi derdî we dikalî şeb û roz

**Ellah Ellah** çerx û dolabê dinê
Nuqte qet nakit di dewranê xelet

Bê tu ya lebşeker î ya tu nebata bi ter î
**Ellah Ellah** çi tecella ye ji sirra qederî

**Ellah Ellah** ji çi reng insan î
Yûsufê lebşekerê ‘Ebran î

Çawa xuya dibe Mela ji tekrîra peyva Ellahê gelekî hez kiriye û di dîwanê de di heft cihan de bi kar aniye:

•

**Te divê** berq û birûskan bireşînî tu nezer de
**Te divê** roji xuya bit ji şibakê tu xuya be

**Te divê** zêr û zeber kî me du zulfan bide ber ba
**Te divê** qenci qiyamet li me rabit bi xwe rabe

Mela di van her du beytan de li pey hev misra bi peyvên “te divê” daye destpêkirin ku ev şêweya tekrîrê çêjeke taybet dide mûsîqiya helbestê (Bilgegil 1989, r. 252; Macit, 2016, r. 40):

### 4. Alîterasyon û Asonans

Alîterasyon û asonans du têgehên retorîka Rojavayî ne ku li gor vê disîplînê her du jî ji bo dubarekirina herfan tên bikaranîn. Ferqa di nabera wan de ew e ku "alîterasyon" tê wateya dubarekirina herfên bêdeng, asonans jî tê wateya dubarekirina herfên dengdêr (Macit 2016, r.73). Bêguman dubarekirina herfan di heman demê de dubarekirina dêngên ku ji herfan derdikevin jî îfade dike. Di belaxeta Rojhilatê de jî têgehên bi dubarekirina dêngên herfan re têkildar hene. Bo nimûne di serwa, paşserwa, tesmît, tekrîr û hwd. de ku di vê gotarê de jî em li ser rawestiyan, dubarekirina herfan heye. Di vê çarçoveyê de dema em li van her du têgehan binêrin em dikarin bibibêjin ku cihê ku serwa û paşserwa lê heye, li wir alîterasyon û asonans jî heye. Lêbelê carinan em derveyê van jî rastî dubarekirina herfan tên. Di belaxeta Rojhilatê de ji bo vê yekê têgeheke taybet nehatiye bikaranîn. Ji ber ku alîterasyon û asonans ji bo hemû herfên dubarekirî tên bikaranîn, ew tam li vir dikevin dewrê û ji bo wê tişta ku di belaxeta Rojhilatê de nav lê nehatiye danîn, ev her du têgehên Rojavayî tên bikaranîn. Bêguman ev rewş hunerên alîterasyon û asonansê watedartir dike. Li jêrê ji bo hunera alîterasyon û asonansê di helbestên Melayê Cizîrî de, çend nimûne cih digirin:

•

Can**ê** M**elê** j'qa**l**û b**elê** bend im w**elê** d**e**r kagu**lê**
B**el**g**ê**n gu**lê** rûh**e**yk**elê** **e**w misk **e lê** car**e**k hi**lê**

Di vê beytê de di herfa "l"yê de alîterasyon û di herfên "e" û "ê" de jî asonans heye.

•

Y**ar** h**at** û m**est** **s**ubh**a** **elest** min d**est** bi d**est** **d**î c**a**m **di** d**est**
K**a**gul dib**est** t**aye**k v**erest** vê r**a** şik**est** nîşan **e** q**est**

Di vê beytê de di herfên "s" û "t"yê de alîterasyon û di herfên "a" û "e"yê de jî asonans heye.

•

**Ber** di**lber** û **leb** **be**r **leb** û endami lêk
Xewna me bi yarê bidinê te'bîrê

Di misraya yekem a ê vê beytê de di herfên "b", "Leyla û Mecnûn" û "r" yê de alîterasyon heye.

•

Di lebsê ta**r**î û nû**r**ê pe**rî**rengê sifethû**r**ê
Ji wadê Eymena Tû**r**ê muqeddes ki**r** li min 'e**r**de

Di vê beytê de di herfa "r"yê de alîterasyon heye.

•

Ji Hafiz qutbê Şîrazê Mela fehm er bikî razê
Bi awazê ney û sazê bibî ber çerxê perwazê

Di vê beytê de di herfa "z"yê de alîterasyon û di herfa "ê"yê de jî asonans heye.

•

H**e**r h**e**y'et û h**e**r cism**e**kî h**e**r f**e**rd û n**e**w' û qism**e**kî
Rûh wî di destê ismekî mayî di qebze'w pence da

Di vê beytê de di herfa "e"yê de asonans û di herfên "h" û "r"'yê de jî alîterasyon heye.

**6. Lasayîkirina Dengan**

Ji bilî ahenga ku ji yeksaniya dengên herf û peyvan tê bidestxistin ku mînakên heta bi vê derê di vê çarçoveyê de bûn, lasayîkirin/teqlîda dengên siruştî bixwe jî heye. Carinan armanc ji vê yekê derxistina dengekî ye, carinan jî sazkirina ahengekê ye di navbera deng û mijarê de. Di vî hunerî de mûsîqiya gerdûnê ya serdema helbestvan tê bidestxistin (Wellek, r. 183). Melayê Cizîrî hindik jî be serî li vê şêwazê daye.



Li jêrê ji bo hunera lasayîkirina dengan di helbestên Melayê Cizîrî de, du nimûne cih digirin:

•

Nesîmê sunbul û sêvan seher da hebs û zindanê
Vebû qufla me bêmifte **ziringînî** ji quflê da

Di vê beytê de Mela dengê ku di bêdengiya seherê de ji vebûna qufleya deriyê zindanê derdikeve lasayî kiriye ku ew jî zirîngînî ye.

•

**Hay û hûya** subbûhiyan reqs û semaya qudsiyan
Teşbîhê cewqa sofiyan feryad û zikr û lerze da

Di vê beytê de jî Mela dengê ku ji zikr, reqs û semayê derdikeve bi "hay û hûy"ê lasayî kiriye.

**ENCAM**

Helbest, di edebiyatê de wek cureya herî edebî tê qebûlkirin û ji aliyê huner, estetîk û mûsîqiya xwe ve di asteke bilind de tê hûnandin. Tema û naveroka helbestê çibe ferq nake, eger helbestek ji van aliyan ve serkeftî be, ew helbest tu carî kevin nabe. Di helbesta Kurdî de Melayê Cizîrî ji bo vê diyardeyê wek nimûneyeke girîng derdikeve pêş. Mela di tarîxa edebiyata Kurdî de yekem kes

e ku kêşa erûzê bi hemû regezên xwe û bi awayekî serkeftî bi kar aniye. Berî wî helbesta Kurdî ya ku bi Kurdiya Goranî/Hewramî hatibû nivîsîn, bi kêşa xwemalî/birgeyî bû ku li ser du aliyên pênc birgeyî (5+5) dihat dabeşkirin. Mela di *Dîwan*a xwe de di 118 helbestan de heft behrên erûzê bi kar anîne ku ew jî remel, hezec, recez, serî', muzari', besît û xefîf in. Hemû behrên ku Mela bi kar anîne, pey wî re di helbesta Kurdî de hatine bikaranîn. Ev jî nîşan dide ku piştî Mela sîstema ku wî di kêşa erûzê de daniye hatiye şopandin. Helbestvanên Tirk di kêşa erûzê de bi piranî helbestvanên Îranî şopandine, lêbelê Mela heta bi astekê di kêşê de şêwazeke xweser bi dest xistiye. Mela di cîbicîkirina erûzê de serkeftî ye û di Kurmanciya sade ya rojane de jî erûz bêqusûr tetbîq kiriye. Behrên remel, hezec û recezê piraniya helbestên wî saz dikin ku kojima wan dike % 93.

Serwa û paşserwa jî du hêmanên girîng ên ahengê ne di helbestên Mela de. Ji 118 helbestên Mela di 65 heban de tenê serwa, di 53 heban de jî digel serwayê paşserwa hatiye bikaranîn. Paşserwayên wî yên ku dikevin kategoriya şêwaza Sebkê Hindî balê dikişînin. Mela wek şêwazekê "recez" ji bo serwaya hundurîn (hunera tesmîtê) terxan kiriye. Serwaya hundurîn yek ji taybetiyên xweser ên şêwaza Melayê Cizîrî ye. Wî 31 helbestên xwe bi vê şêwazê nivîsîne. Mela di van helbestan de bi şeş şêweyan serwaya hundurîn bi kar aniye ku ev wek şêwazeke ciyaker a aheng û mûsîqiya Mela derdikeve pêş.

Melayê Cizîrî ji bilî ahenga ku ji kêş, serwa, serwaya hundurîn, paşserwa û neqeratan tê bidestxistin, ji hin hunerên bedî'î yên wek î'ade, 'eks, tekrîr, alîterasyon û asonansê jî ahengeke cuda bi dest xistiye. Herweha lasayîkirina dengan jî taybetiyeke mûsîqiya Melayê Cizîrî ye.

Tişta girîng ev e ku ev hêmanên ahengê û şêwazên curbicur ên mûsîqiyê, di edebiyata Kurdî de cara pêşî ji aliyê Mela ve bi şêweya kombînasyoneke hunerî bi hevre hatine bikaranîn. Ev regez û şêwazên hunerî bi destê Mela ketine nav edebiyata Kurdî ya klasîk. Modelên Mela yên wek Hafiz, Se'dî û Camî di edebiyata Farisî de hene, lêbelê di vê xebatê de aşkera dibe ku Mela, di huner û estetîka xwe de ji wan ne kêmtir e û hin şêwazên orjînal dahênane ku li cem wan nayên dîtin.

Guman tuneye ku Melayê Cizîrî bi vê şêwaza xwe bandorek li pey xwe hiştiye. Gelek helbestvanên Kurd di helbestên xwe de di bin bandora wî de mane û di hunera xwe de ew wek model wergirtine. Ji ber vê jî pêwendiyên Mela û şopgerên wî, pêwiste di çarçoveya rêbazên edebiyata berawirdî, navbermetnî û şêwaznasiyê de bên tesbîtkirin.

## JÊDER


'Ebdûn, 'E. (2001). *el-Mûsîqî eş-Şafiye li'l-Buhûr es-Safiye*, Qahire: el-Erebî li'n-Neşr.

Adak, A. (2013). *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Stenbol: Nûbihar.

Aytaç, G. (2016). *Genel Edebiyat Bilimi*, İstanbul: Doğubatı.

Ayvazoğlu, B. (2000). “İlmü’l-Cemal”, *DIA*, berg: 22,  r: 146-148.

Cizîrî, M. (2010). *Dîwan*, amd: Selman Dilovan, Stenbol: Nûbihar.

Ebdula, H. X. (2011). *Berawirdiyeke Kêşnasî di Navbera Erûza Kurdî û Farisî-Dîwanên Melayê Cizîrî û Hafizê Şîrazî Wek Nimûne*, Dihok: Spîrêz.

Eliot, T. S. (2007). *Edebiyat Üzerine Düşünceler*, (wer. Sevim Kantarcıoğlu), İstanbul: Paradigma.

Fesaî, M. R. (1373). *Enwa’ê Şi’rê Farisî*, Şîraz.

Gerdî, E. (1999). *Serwa*, Hewlêr: Aras.

el-Haşimî, S. E. (1997). *Mîzanu’z-Zeheb fî Sin’et Şi’r el-‘Ereb*, Qahîre: Mektebet el-Adab.

el-Haşimî, S. E. (2012). *Cewahiru’l-Belaxe*, Beyrût: Muessese el-Kutub es-Seqafiyye.

Haşimî, M. H. (1390). *Rewzene Mecmû’eî Amûzişî Şi’r*, Meşhed: Spîdebaweran.

Herdî, E. (2004). *el-’Erûz fi’ş-Şi’ri’l-Kurdî*, Erbîl: el-Mecme’u’l-’Ilmî el-Kurdistanî.

İpekten, H. (2002). *Nazım Şekilleri ve Arûz*, İst: Dergâh.

Bilgegil, M. K. (1989). *Edebiyat Bilgi ve Teorileri*, Istanbul: Enderun Yay.

Levend, A. S. (1984). *Divan Edebiyatı Kelimeler ve Remizler Mazmunlar ve Mefhumler*, İstanbul: Enderun.

Macit, M. (2016). *Divan Şiirinde Ahenk Unsurları*, İstanbul: Kapı.

Mevlevi, T. (1994). *Edebiyat Lügatı*, İstanbul: Enderun Yay.

Pala, İ. (2003). *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, İstanbul: L&M Leyla û Mecnûn Yay.

Reşîd, M.C. (2017). *Kêş û Serwa di Hozana Kurdî de*, Duhok: Dezgey Nalbend.

Saraç, M. Y. (2016). *Klasik Edebiyat Bilgisi Belagat*, İstanbul: Gökkubbe.

Şemîsa, S. (1378). *Kulliyatî Sebkşinasî*, Tehran: Întîşaratî Firdews.

Teftazanî, S. (1960). *Muxteseru’l-Me’anî*, İstanbul: Bahar Matbaası.

Tebrîzî, X. (2014). *Kitabu’l-Kafî fi’l-‘Erûz we’l-Qewafî*, Beyrûd: el-Mektebe el-‘Esriyye.

Wellek, R. & Warren, A. (1948). *Theoryn of Literature*, New York: Harcourt, Brace and Company.

Xeznedar, M. (2002). *Mêjûy Edebî Kurdî*, (berg 2), Hewlêr: Dezgay Aras.

Yetiş K. (1988). “Âhenk”, *DIA*, (berg: 1, r: 516-517), İstanbul: DIA.

Zerqanî, S. M. (1345). *Bûtîqayî Klasîk*, Tehran: Întîşaratî Soxen.